Kurteçîrok

XWERAGIRTIN

Îsmet Mihemed Bedel

Dîmenê wê, demê bi tenê ji xwendingehê derkevtî û li ser şostey sernişîv dibû mîna dizekî li xwe bi şik dihate pêş, ya ji wê ve çavên hemû xelkê lê ne, wesa hizir dikir demê daxwaza wî kabirayê xudanê wê peleya bilind bi cih diîne, ya kiryareke pirî fihêtî û şermezarî dike. Wê sipêdeya sara zivistanê xwênkarên xwe bi cih dihêle û li dû daxwazekê diçe. Çu deman bawerî pê neyî, lewra jî wê gavê xwe gelek biçûk û bê biha didît, ew mirova her dem li xwe dinêra wek firîşteyeke bê guneh û xwedan baweriyeke pak û bijûn û kesatiyeke bi hêz û miroveke xweser di her biryareka xwe de, hemû deman daybabên wê baweriyeke bê sînor pê hebû û hemû şiyan terxan dikirin bibe xwedana vê kesatiya bê wêne, her ev kesatiya wê ya bi hêz bû, dibû mezintirîn asteng di riya her bizaveka nefisnizmekî de bi niyazeke xirab temay di ciwaniya wê ya firîşteyê de bike, yan wêreyekê bide xwe zêdeqiyekê çi bi axivtin yan bi kiryar yan heta bi nêrîn jî li ser bêgunahiya wê bike.

Vê carê jî nizanî çawa hejya û çawa rê da xwe derzek bikeve dîwarê wêrekî û dilêriya wê, hizir dikir heger bi dû vê daxwazanezelal jî didît-neçe, dê serê wê bikeve ber arêşeyan, yan çawa bawerî da rêvebera xwendingehê! ya ku piştî çendîn bizavan li çendîn rojan şiyayî li wê sipêdehiya sara zivistanê ji nav xwêndekarên ciwanên rêza êkê derbêxe, ew ên di gel wan hest bi guncandineke reha ya derûnî dike, nexasme ew xwe gelek bê guneh dibîne û bi nîvferman qayîl bike li gor telefoneke ji wî cihê bi fermî daye niyasîn hatî, divê piştî çarîk seeta dî li wî cihê berhev bibe ji bo karekî gelek pêdivî û heger neçe dê berpirsiyar be.

Demê bi rê ve diçû dilê wê sed awaz digotin, pêkolek mezin dikir xwe qaîl bike ku çûna wê çu gunehek mezin tê de nîne, belku encamdana erkek fermî ye, rêveberê sipardiyê, yan jî dibe

qaîlkirina wê be ku hindek erkên dî yên dervey karê wê rabe, wî demî û hêşta negiheştiye ber deriyê mezin, ew roj dihate bîrê demê ew kabira li xwandingeha wan bûye mêvan û hemû mamoste neçar bûn di gel rûnin û guhdariya axivtinên wî yên sar û ji her wateyekê vala bikin û bikevin beranber avirên wî yên weku tîra vê dikevtin, wî demî pêhesiya ev awiriye ne vala û dê serkêjîyekê yan dibe karesatekê bo çê bikin, lewra jî her ji wê gavê, tirseke mezin hingavt û sed hêvî xwaztin ev rûniştine bi selametî bibore, lê demê bi dûmahî hatî û mamoste rabûn û berî verevin, kabirayî bi delîve zanî, bi rêza wan re bihêt, destê wan, ewê hest pê kir merema wî, ew bû, çiku çavên wî, ew xafil nedikir û demê giheştiye rasta wê, neçar bû weku hevalên xwe yên dî destê xwe jê re dirêj bike, wî jî bi merema gehandina nameyekê ku ew xirab têgehişt destê wê zêde givaşt, şermê û tirsê şiya kesatiya wê ya bi hêz, rûkên wê sor û zer kirin, devê wê hate girêdan û peyvek jî jê neverest. Ev bîrhatinên hatîne bîrê rewşa wê ya derûnî ya têkçûyî pitir têk da, ew rewşa piştî wê rûniştina di gel wî kabirayî weku xwe, zelal nemayî, piştî hingê demê di gel hevalên xwe bi tirombêlê ber bi xwandingeha qûnaxekê ji mala wê dûr dihat, ne stiranên li ser dengirê ew ên gelek hez jê dikir û ne dîmenê ciwanê siruştî, nemaze demê baran dibarî û ne suhbetên hevalan dikarîn dêmê wê yê têkçûyî vekin, pê dihest hevala wê ya her dem li rex teniştê rûdine çendîn caran bizavê dike vê suhbetê di gel veke, lê demê bêzariya wê ya ji hemû qama derkevtî dibîne lêve dibe û di xwe re na bîne ji pirsa egerê vê têkçûna wê ya ji nişkekê ve jê bike, ew xwandingeha berî niha bi zewq qest dikirê, hez nedikir dewam bi dûmahî bibe, di gel hemû mamosteyan wesa guncay bû dewama wan hemû bi pêkenîn û tirane û yarî û suhbetên xweş bi dûmahî dihat, heta wê rojê her wekî beratafî jîwarekê dî bûyî, ew cîhana berî hîngê bê guneh û zelal didît têk diçû, ew kevalê ciwan û nimûneyê wê endêşeya xwe de nexiş dikir, niha wesa xuya nake.

Van bîrhatinan gelek nêzîkî ber deriyê mezin kiribû, serma û tirs û şermê hêza xwe kirbûn yek û direcifand û demê digişte rasta derî, hindî dihatê nedikarî çep bide û biçe jor, wê baş dizanî daxwazên wî kabirayî derbazî erkên fermî dibin, lewra jî dirîjî bi rêveçûna xwe dida û jê diborî û çend jê dûr dikevt, hest bi aramiyeke mezintir û kûrtir dikir, tirsa gefên wî di dilî de vedirevî, serê wê yê çemiyay jî hêdî-hêdî bilind dibû.